# FEVKALADE TEHLİKELİ fanzin

eylül 2011 sayı 03



# HİZAYA GELME REDDET!



# KADININ ÖZGÜRLEŞMESİ ANARŞİZMLE MÜMKÜNDÜR

## ANARŞİZM NEDİR?

**Anarşizm; özgürlüğün ve adaletin gerçekleştiği toplumsal düzendir. Bu otoritenin ve mülkiyetin ortadan kaldırılmasıyla mümkündür. İnsanın insan üzerindeki, insanın doğa üzerindeki ve diğer tüm canlılar üzerindeki tahakkümünün sonlandırılması, paylaşma ve dayanışma üzerine kurulu bir yaşamın örgütlenebilmesi ve Komünizmin hayat bulması Anarşizmle mümkündür.** Herkesin ihtiyacına göre ve verebildiği kadar ilkesini benimseyen üretim ilişkilerini bu doğrultuda düzenleyen Anarşist toplumda yönetim devletin değil, halkın kendi iradesindedir; öz yönetimindedir. Anarşist toplum yukarıdan aşağıya merkezi değil, parçalı yatay örgütlenmeyi savunur; hiyerarşiyi ve merkezileşmeyi reddeder. Yerel otonomların merkezsiz birliği olan bir federasyonla toplumsal işleyişini düzenleyen Anarşizm toplumsal ve yaşamsal bir özgürlük tahayyüldür. Anarşizm bireyin özgürleşmesiyle, toplumun özgürleşmesi arasında bir öncelik, aşama koymaz. Birey özgürleşirse toplum gerçekten özgürdür. Birey kendini gerçekleştirirse devrim gerçekten devrimdir. Anarşist Kropotkin; toplumsal ilişki tarzının bireyi özgür

kılabileceğini söyler ve paylaşma, dayanışma temelli komünlerin varlığında, bireyin kendini gerçekleşirmesinde ki önemi vurgular. Günümüzde kapitalizm 'bireyselleşme' ile 'birey'olma arasındaki ince çizgiyi ortadan kaldıran bir sömürü düzeni olduğundan artık sözde bireyselleşen ancak kendini gerçekleştiremeyen bireyler vardır. Sadece kapitalizm için değil, sosyalizm içinde durum benzerdir. Anarşist toplum, devletsiz ve sınıfsız toplumdur. Bu toplumun yaratımı; bireylerin yaşamsal üretim ve tüketim ilişkilerinin kolektif bir zeminde çözümlendiği, politik stratejilerin ve anlık manevraların örgütlü siyasi birlikte tanımlandığı, sürekli ve programlı bir yolun yaratılmasıyla mümkündür. Anarşist mücadele; hayatın kendisidir. Sınırlar ve sınıflar arası adaletsizliklerin işlediği bir düzende bireyin hayatta kalma çabasıdır. Direnmektir, direnmeyi öğrenmektir. Öz savunmadır. Baskının, sömürünün işlediği bir toplumsal düzene teslim olmamaktır. Toplumsal dönüşümün ve yaratımın kendisidir. Mücadelemiz küresel kapitalizmin ve devletlerin karşısındadır. Cinsiyetçi erkek egemen sistemin karşısındadır. Baskıcı ve zorba olan tahakküm biçimlerine karşıdır.

## KADININ KONUMU VE TOPLUMSAL CİNSİYET

Yaşadığımız toplum ve toplumun tüm değer yargıları cinsiyetçidir. Aile cinsiyetçidir. Dinsel öğretiler cinsiyetçidir. Kültürel ve ahlaki normlar, kurallar, yasalar, örf ve adetler cinsiyetçiliği normalleştirir. Kadınlık ve erkeklik kültürel olarak inşa edilen ve öğrenilen kalıplardır. Toplumsal olarak kurulan bu toplumsal cinsiyet kalıpları, kadın ve erkeğin toplum içindeki konumu ve bu konuma uygun rollerini, kadın-erkeğin, özel ve kamusal alanda nerede duracağı, toplumsal hayata ne oranda katılacağı ve nasıl temsil edileceğini belirler.

**Toplumsal cinsiyet; biyolojik cinsiyetten farklı olarak toplumsal ve kültürel olarak belirlenen ve dolayısıyla içeriği toplumdan topluma olduğu kadar tarihsel olarak da değişebilen 'cinsiyet konumu' ya da 'cins kimliği' dir.** Bu anlamıyla toplumsal cinsiyet yalnızca cinsiyet farklılığını belirlemekle kalmaz, aynı zamanda cinsler arasındaki iktidar ilişkilerini de belirler. Kadının konumunu, kadının ev içinde ve ev dışındaki konumunu belirleyen, kadının bedeni ile cinselliği üzerindeki kontrol ve cinsiyetler arası eşitsizliği besleyen, koruyan ve yeniden üreten durumlar üzerinden anlaşılabilir. Bu durumlar; küçük yaşta ya da istenmeyen zorla evlilikler, başlık parası, töre, boşanma kuralları, namus cinayetleri gibi aileye ilişkin toplumsal durumlar ile kadının eğitim durumu, çalışma olanakları, siyasal ve toplumsal hayata katılım düzeylerini gösteren daha çok ekonomik olan durumlardır. Kadın, cinsiyetçi iktidarın, erkek egemenliğinin sömürüsüne kaçınılmaz şekilde maruz kalmakta ve günümüz kapitalizmiyle birlikte sömürüye daha fazla saplanmaktadır.

Sonuç olarak ise cinsiyete dayalı işbölümü temelinde bakarsak büyük oranda kadının



'ev kadını' ve "annelik" rollerine sıkıştırıldığını söyleyebiliriz.

## KADININ ÖZGÜRLEŞMESİ KAPİTALİZMİN REDDEDİLMESİDİR...

İnsanlığın, varoluşuna ve tüm yaşam kültürüne saldıran, sıçradığı her alanı piyasalaştıran kapitalizm, insanlık tarihi boyunca var olan kadın sömürüsünü önceki egemen sistemlerden devralıp dönüştürerek toplumsal bir boyuta taşımıştır. Cinsiyetçi toplumlar yaratmış, devletin tüm aygıtlarını erkek egemenliğini yeniden üretmek üzere şekillendirmiştir.

Erkek; evde reis, iş yerinde patron, yaşamsal alanda koşulsuz iktidar olmuştur.

Kadın; kapitalist toplumda emek sömürüsüyle beraber aynı zamanda beden sömürüsüne maruz bırakılmış ve kapitalizmin vahşi pazarında birer reklam unsuru ve cinsel obje olarak metalaştırılmıştır.

**Kapitalizmin eleştirisini yapmayan, kapitalist üretim ve tüketim ilişkilerini gözden geçirmeyen, yaşamsal olarak kapitalizmin yarattığı kültürel burjuvaziyi yaşamlardan söküp atamayan bir kadın mücadelesinden bahsetmek eksik olacaktır. Bu büyük eksiklik kadınları erkek egemenliğine karşı verilen mücadelede bireysel farkındalıklar yaratmaktan öteye geçiremez.**

Kapitalist toplumda kadının yoksullaşması ve kapitalizm kıskacında sömürülerek yoksunlaşması hali kaçınılmazdır. Bu durumda anti kapitalist bir mücadeleye gereksinim ortaya çıkar. Kadın; kapitalizmle kurduğu sosyal ve ekonomik

bağları ortadan kaldırarak, kolektif üretime dayalı tüketim zemininde ve kolektif yaşamsal ilişkilerde kendisini yeniden tanımlamalıdır. Bütünlüklü bir mücadele olarak Kapitalizm topyekün reddedilmelidir.

## KADININ ÖZGÜRLEŞMESİ İKTİDARIN REDDEDİLMESİDİR…

Kadınların erkek egemen bir sistemde farklı tahakküm biçimleriyle sömürüye maruz kalmalarının en temel nedeni iktidarın varlığıdır. Anarşizm; sadece siyasal ve ekonomik iktidarı değil, hepsinden önce ve hepsinden öte, insanın insan üzerinde kurduğu iktidarın ortadan kaldırılması gerekliliğinden bahsetmektedir. 'Muktedir olmak', diğer yandan muktedir olana biat etmek her iki durumda da güç ilişkisinin bir sonucudur. İktidarın mutlaklaşmasının ölçüsü, iktidar olanın da ona tabi olanın da bu güce tapınma ölçüsüdür. İktidarın dayattığı güç ilişkisi tek taraflı değildir, iktidarın kendisi ve ona tabi olanın biatı olmadan iktidar süreklilik kazanamaz. Biat eden bu gücün kölesi haline gelir. İktidar ise gücü elinde bulundurmaya bağladığı oranda, gücünü yitirme kaygısı ile kendi gücünün kölesi olur. **Günümüz erkek egemen sisteminde erkek ve kadın ilişkisini bu bağlamda ele alırsak kadının özgürleşmesi öncelikli olarak iktidarı elinde bulunduran erkeğe biat etmeyi reddetmekten geçmelidir. Böylece kadının özgürleşmesi iktidarın reddedilmesi ve iktidarın uyguladığı tüm tahakküm biçimlerinin ortadan kaldırılmasıyla mümkündür.** Dolayısıyla erkek düşmanlar, erkekleşen kadın görünümlü düşmanlar, erkekleşmek için iktidarlaşmak zorunda kalmanın kaçınılmaz görüngüleridir.



# ANARŞİST KADINLAR ÖZGÜRLEŞİYOR...

'Tarih boyunca esaret altında bir kadın var. Kurtarılmayı bekleyen, kurtulması gereken kadın. Kurtulmaksa; hem karşı cinse savaş açmakla hem de eşit, adaletli ve özgür bir dünya yaratmak peşinde mücadele etmekle mümkün. Kurtulmak devrim. Devrim ise kadın için mutlak kurtuluş demek.'

Anarşizm, bu tarihsel ezberi ve çizgisel mantığı reddetmektedir. Anarşist kadınlar; kadınların devrimle gelecek kurtuluşundan değil, kendisini özgürleştirerek bugünden yaratacağı içsel devriminden bahsetmektedirler. Bu içsel devrim düşlediğini eyleyen hayatlarının kontrolünü bugünden eline alan özgürleşen insanların devrimidir. Kadınların mücadelesi bütünlüklü olmakla birlikte aynı zamanda tüm insanlığın dönüşümünü sağlayacak bir devrim mücadelesidir. Cinsiyetsiz ve iktidarsız bir toplumun, kapitalizmin ortadan kaldırılarak eşit ve adaletli bir dünyanın yaratılmasıdır.

**Dolayısıyla biz Anarşist kadınlar olarak bizlere dayatılan toplumsal cinsiyet rollerini, cins ayrımcılığını, erkek egemen anlayışı, iktidar mekanizmalarını ve hayatlarımızı çalan kapitalizmi reddediyoruz. Kolektif paylaşım alanlarımızı çoğaltarak sosyal ve ekonomik çözümlemelerimizi bugünden ortaklaştırıyoruz.**

Devletin ve devletin dili olan yasaların çözüm zeminlerinden medet ummayarak, dayanışmacı kolektif birlikteliği ve inancı yaratıyoruz. Dünyanın bir ucundan diğer bir ucuna duyuluyor; Brezilya'nın topraksız kadınlarından, Zapatistalar'ın özgür komünlerinden, Kürdistan'ın itaatsiz, Paris komününün kara bayraklı, İspanyanın yürekli kadınlarından yükselen çığlıklar... Özgürleşen kadınların çığlıkları... İsyan çığlıkları...

Bu çığlığı kulak verin...



# BİR İKTİDAR BELİRLENİMİ OLARAK MİLİTARİZM

*'Ben inanıyorum ki, dünyanın özgürlüğe aşık ruhları, efendilerine, 'Cinayetlerini kendin işle! Senin savaşlarına kendimizi ve sevdiklerimizi yeterince feda ettik! (…) Hayır, senin cinayetlerini işlemeyeceğiz ve senin bizden çaldığın topraklar için (ülke) için savaşmayacağız!' dedikleri gün militarizmin sonu gelecektir'*
*Emma Goldman*

Zorunluğu askerliğe(dini, politik, ahlaki, vb. nedenlerle) karşı olma durumu olarak adlandırılan vicdani ret; yükselen savaş naralarına karşı, savaşı durdurabilecek en etkin yollardan biri. Savaşa karşı, kardeş kanı dökmeye karşı, ölmeye ve öldürmeye karşı tüm vicdani retçiler yaşamı savunmaya örgütleniyor.

Türkiye'de ilk kez 1989'da Tayfun Gönül'ün vicdani reddini açıklamasıyla bu toprakların politik literatürüne giren vicdani ret, artık zorunlu askerliği reddetmekten başka, yaşamlarımızın her alanını gasp eden militarizmi bütünüyle reddeden bir algı yaratıyor.

Militarizm her ne kadar kelime kökeni olarak orduyla ya da askerlikle bağıntılı bir kavram(militarizm kelimesinin kökeni, Latince "askerlik ve savaşa dair" anlamına gelen militaris'e dayanmaktadır) gibi duruyorsa da, kavram artık bu kapsamdan çok daha geniş bir çerçeveyi ele alıyor. Hayatlarımızın her alanına sızmış olan (örtülü ya da açık) şiddet, bütünüyle militerleşmiş bir algı yaratarak bireyi baskılıyor.

'Erk' şiddetin meşrulaştırıldığı okulda, ailede, sokakta ve toplumsal yaşamın hemen her alanında bireyler militarist algılarla baskılanmaktadır. Toplumsal statülerin gereği olarak bürünülen toplumsal roller, yaşamın militerleşmesine sebep olur. Ailenin reisi baba ev içi ilişkilerde militarizmden beslenir, toplumsal yaşamda erkek militarizmden beslenir, toplumsal alandaki tüm ilişkiler militarizmden, otoriteden dolayısıyla iktidardan beslenir.

**Militarizm, örgütlü olan şiddettir ve örgütlü şiddet yaşamın her alanına nüfus etmiştir. Militarizmin tüm yansımaları, hiyerarşik biçimde organize edilmiş, ast-üst ilişkileriyle belirlenmiş ilişki biçimlerinde açıkça görülmektedir. Kaçınılması neredeyse imkansızlaştırılmış olan bu süreç boyunca birey, militarizmin soğuk nefesini ensesinde hissetmekten kaçamamıştır.**

Yaşam boyu devam eden bir süreç olan militarizasyon, bireyin doğumundan başlar ve ölümüne değin devam eder. Her insanın aslında bir 'bebek' olarak dünyaya gelmesine rağmen birey, içine hapsolduğu algı içerisinde insan asker edilmeye hazırlanır.

Ailede başlayan militarizasyon süreci, aile içinde kurulan ast-üst ilişkilerde somutlaşır. Anne, baba ve çocuktan oluşan bir çekirdek ailede hiyerarşik biçimde evde önce baba, ardından anne en son da çocuk söz hakkı elde edebilir. Hem toplumsal cinsiyet rollerinin hem de gerontokrasinin buluşmasıyla başlayan bu evre okulla da ilerleyişini hızla sürdürür. Okula başlayan çocuklar, bu 'eğitim' sürecine girdikten itibaren nizami sıralara sokularak, her sabah Türk olmanın verdiği gururla ant içerek yavaş yavaş askerleştirilirler. 'Eğitim' ilerledikçe tarih dersleriyle, siyasal egemenlerin ideolojisi ve tarihi dayatılır ; çocuklar milli güvenlik dersleriyle kışlalara ve 'vatan uğruna' ölmeye hazırlanmaya başlar.

Tüm bu biçimlendirme evresinden sonra yaratılan birey artık hem egemen ideolojiye hem de iktidarların varlığına hizmet eden bir araç haline gelmiştir. Yıllar boyu süren bu 'yaratım' evresi o kadar başarılı olmuştur ki artık herkes ölümü kimlik haline getirmiştir. Yükselen savaş naraları, kaybedilen yaşamlar/çalınan hayatlar görünmez olmuş, geriye kalan tek gerçek ise militarizmin yarattığı




'iradeleri çalınmış ölü bireyler' olmuştur. Biten bir eğitim sürecinin ardından geriye, şiddeti, ölümü, militarizmi kanıksamış bir birey kalır.

Bir kadın olarak, toplumsala uyma zorunluluğu ise militarizmin hem gizli hem de açık şekilde, farklı biçimlerde kendini gösterdiği süreçlere yol açmaktadır. Yaşamı boyunca erk, ata, namus gibi belirlenimlerle baskılanan ve çoğu zaman yok sayılan kadının bu süreçte özgürlüğünü elde edebilmesi ihtimali bile ortadan kaldırılmıştır. Bu vatan için feda edebilecek oğullar yetiştiren, vatan uğruna canından olmaya hazır eşlerin/sevgililerin yolunu gözlemeye mecbur bırakılan kadına dayatılan tek kimlik ise ölümdür. Ataerkil bir topluma aidiyet, kadının ölümü olmuştur.

Militarizm hem savaş zamanında hem de barış zamanında kadının hayatını gasp etmektedir. Savaş zamanında ölmeye ve öldürmeye hazır erkek evlat yetiştiren, 'vatan sağ olsun' demeyi kanıksayan kadın barış zamanında da bu militarizasyonun dayattığı erk şiddete maruz bırakılmaktadır. Fiilen savaşın olmadığı zamanlarda dahi kadın, toplumsal cinsiyet rollerinin gerektirdiği biçimde şekillendirilmiş, korunması gereken pasif özneler haline getirilerek yok sayılmıştır.

Bizler kadının varoluşunu, yaşamını, kimliğini yok sayan ve bunu meşrulaştıran militarizmi reddediyoruz. Bizler bu savaşın içine itilmeye, kardeş kanı dökmeye mecbur bırakılacak evlatlar yetiştirmeye, asker yolu gözlemeye, namus adı altında yok sayılmaya, töre uğruna katledilmeye karşı çıkıyoruz.

## Reddediyoruz!

Bizler anarşist olduğumuz için bireyin iradesini yok sayan, onu bir iktidar altında baskılayan militarizmi reddediyoruz. Militarizmin, iktidarın bireyi belirleme sürecindekullandığı bir araç olduğunu biliyoruz. İktidarlar varlıklarını sürdürebilmek için kimliksizleştirilmiş, iradesizleştirilmiş, esaret altına alınmış bireylere mecburdurlar ve militarizmin görevi iktidarların varlığını daim kılmaktır.

**Bizler iktidarsız, otoritesiz bir dünya hayal ediyoruz ve özgür bir dünyayı yeniden yaratım evresinde militarizasyon sürecinin yok edilmesi gerektiğini söylüyoruz. Bu yüzden hayatlarımızı gasp eden bu şiddet dolu algıyı tüm vicdanımızla reddediyoruz.**

# Savaşta KADIN olmak

**Savaş, uygarlığın başlangıcından bu yana erkin iktidar simgesi olarak ifadesini bulurken, kadınlar anne, eş, çocuk, dost veya yoldaşlar olarak savaşın hem birincil hem de ikincil derecede özneleri olagelmiştir.** Savaş, kadını bir yanıyla militarist koşulların hayatın tümünü kapsayan tahakkümüyle karşı karşıya bırakmışken, diğer yanıyla onun değer verdiklerinin, canından parçası olanların göz göre göre can verdiği bir yaşamın 'olağan' ve 'vatan' için olduğuna inandırmak istemiştir.

Toprağın ve vatan namusunun simgesi olan kadınlar, her daim devlet tarafından korunması gereken özneler olarak üstünde masabaşı politikalar üretilen bir güruh olarak görülür. Kadın, toplumsal ve siyasal alanda kendi yaşamı hakkında söz hakkına sahip olmadığı gibi, devletin masa başında verdiği kararlar da yine kendisine biçilen bu 'namus' ve 'haysiyet' kanunlarına göre alınır. Ana evlatlarının katli, vatan namusunu korumak adına 'masa başında' devlet erkanlarınca karara bağlanır. Bu savaş kimin savaşı, bu haysiyet kimin haysiyetidir?

Bugün dünyanın dört bir yanındaki annelerin yaşam çığlıkları her katliamda, soykırımda ve savaşta hiç durmadan yankılanıyor. Tüm dünyada olduğu gibi, Ortadoğu'da soluk aldırmayan savaşların beşiği olan Türkiye'de de, 12 Eylül döneminde katledilen devrimci evlatlarının acılarını yüreklerinde taşıyarak isyanlarını devletin suratına haykıran Cumartesi anneleri, hiç bıkmadan usanmadan adalet için seslerini yükselttiler. Kürdistan'da



bitmek bilmeyen savaşın içerisinde yaşam savunucusu haline gelmiş Barış Anneleri, faşist devletin korkunç saldırılarına ve oluk oluk kan akıtan ölümlere karşı barışı haykırıyorlar.

## Bir savaş yöntemi olarak 'tecavüz':

Militarizmin birebir öznesi olan, evlatlarını savaşta kaybeden kadınlar, her gün tecavüze uğradığı erk tarafından, bir de fiili olarak savaşlarda tecavüze uğramaktadır. Vatan namusunun kadına faturası olan 'etnik tecavüz', Bosna-Hersek'te Karadziç komutasındaki Serebrenica katliamında tecavüze uğrayan kadınların, Obama'nın Ebu Garip'teki 'demokrasi' birliklerinin vahşice tecavüz ettiği binlerce kadının, Filistin'de İsrail askerleri tarafından, Türkiye'de gözaltında tecavüz ve tacize uğrayan, Kürdistan'da 300 küsür asker tarafından tecavüz edilmiş, ve daha yüzlercesi etnik tecavüze uğrayan Kürt kadınlarının yaşadığı vahşetler, erkin namusuna feda edilmiş onlarca yaşamın nüshasıdır... Kamile Öztürk, Ayşenur Şimşek, Cahide Karataş, Leman Çelikaslan, Sadet Akkaya, Menice Kırtay ve daha bilmediğimiz yüzlercesi..

**Kadınların cinsel organlarının dağlandığı, meme uçlarının kesildiği, dipçikle tecavüz edildiği kan tarlalalarında kadınlar yalnızca evlatlarını kaybetmekle kalmazlar. Toprağın ve namusun simgesi olarak misyonu gereği evlatlarını vatana feda ederken, vatan soyunun ve düşman tohumunun yok edilmesi için karşı güçlerce tecavüze uğrayarak militarizmin 'feda kültürünün' asli temsilcileri haline gelirler.**

Savaşlar ve militarizm özü itibariyle cinsiyetçidir, yaşanan ve yaşatılmak istenen her türlü katliama karşı sesini yükseltmesi gereken kadınlar olarak vicdanımızla haykırıyoruz: Feda etmeyeceğiz, feda olmayacağız!

Edi bes e!



# FEVKALADE TEHLİKELİ fanzin

îlon 2011 hejmar 03



# NEKEVE HÎZAYÊ RED BIKE!



# AZADBÛNA JINÊ BI ANARŞÎZMÊ PÊKAN E

## ANARŞİZM ÇI YE?

**Anarşîzm; ew pergala civakî ye ku azadî û edalet tê de hatiye pêk anîn. Ev bi rabûna otorîteyê û mulkiyetê pêkan e. Rabûna pêkutiyên mirovan ya li ser mirovan, li ser xwezayê û li ser hemû zindiyan, birêxistina jiyanê ya li ser esasa parvekirinê û piştgiriyê û jînbûna Komînîzmê bi saya Anarşîzmê pêkan e**.

Civaka Anarşîzmê ya ku rêgeza her kesî li gor pêdiviyên wan û li gor zanebûna dê çi qasî karibe bide wan dihewîne di xwe de têkiliyên hilberînê jî bi vî esasî sererast dike û dibêje rêveberî ne ya devlet ye ya gel bi xwe ye, di xwerêvekirinê de ye. Civaka Anarşîst rêveberiyek ji jor ber bi jêr ve na, rêxistinbûyîneke parçe parçe û berwarî diparêzê; hiyerarşiyê û navendkêşiyê naparêze.

Anarşîzma ku bi federasyonekê otonomiyên cigayî bi yekitiyeke bênavendî xebitîna wan sererast dike sêwirîna azadiyeke civakî û jîndarî ye. Anarşîzm di navbera azadbûna takekes û civakê de pêşdatiyekê, hiyeyarşiyekê qebûl nake. Ger takekes azad be civak bi rastî jî azad e. Ku takekes xwe azad bike şoreş bi rastî jî şoreş e.

Kropotkinê anarşîst dibêje bi şiklê têkiliya xwe ya civakî takekes dikare xwe azad bike û bi hebûna komûnên li ser esasê parvekirin û piştevaniyê bal dikşîne ser girîngiya xwepêkanîna takekesî.

Di roja îroyîn de ji ber ku kapîtalîzm ew pergala kedxwariyê ye ku xeta zirav ya di navbera “takekesîbûn” û “ferdîbûnê” de ji holê rakiriye êdî ferdên qaşo takekes lê belê nikarin xwe pêk bînin henin. Tenê ne ji bo Kapîtalîzmê, ji bo Sosyalîzmê jî rewş mîna hev e. Civaka Anarşîst, civakek bêdevlet û bêçîn e.

Afirandina vê civakê; bi çareserkirina li ser zemîneke kolektîf ya têkiliyên serfkarî û hilberiya jîndarî ya takekesan, bi terîfkirina bi hev re ya stratejiyên polîtik û werzanîkirina demî, bi avakirina rêyeke bi program û bi berdewamî gengaz e.

Têkoşîna anarşîst jiyan bi xwe ye. Di pergala ku tê de bêadaletiyên di navbera sînor û çînan de heye hewldana takekes ya kêferana jiyanê bi xwe ye.

Berxwedan e, hînbûna berxwedanê ye. Xweparastin e. Teslîmnebûyîna pergala civakî ya ku tê de pêkutî û kedxwarî wer tê bikaranîn e. Guherîna civakî û afirandinê bi xwe ye.

Têkoşîna me li hember kapîtalîzm û devletên global e. Li hember pergala serdestiya mêran e. Li hember hemû çewsandinên zordest û zordaran e.

## REWŞA JINÊ Û ZAYENDA CIVAKÎ

Civaka ku em tê de dijîn û hemû rûmetên wê zayendparêz e. Malbat zayendparêz e. Zanînên olî zayendparêz e. Normên ahlakî û çandî, qaîde, zagon, urf û adet zayendparêzî asayî kirin e. Jin û mêrtî ew qalibin ku bi çandî ava dibin û tê hînbûn. Ev qalibên zayendî yên ku bi civakî tê avakirin di civakê de cihê jin û mêr û rolên li gor wan, jin û mêr, di qadên çi taybet çi jî gelemperî de dê li ku bisekinin, dê çi qasî tevlî jiyana civakê bibin û dê çawa werin temsîlkirin diyar dike.

**Zayenda Civakî; ji xeynî zayendiya biyolojîk weke civakî û çandî tê diyarkirin û ji ber vê yekê naveroka wê her çi qas li gor civakan were guhertin jî bi demê re jî tê guhertin û dibe ‘pozîsyona zayendê’ an jî ‘nasnameya zayend’.**

Bi vê mebestê zayenda civakî tenê cudawaziya di navbera zayendan de diyar nake, di heman katê de desthilatdariya di navbera zayendan jî diyar dike.

Rewşa jinê, ya ku rewşa wê ya li hundir û derveyî malê diyar dike, ya ku bedena jinê û qontrola li ser cinsîtiya wê û newekheviyên di navbera zayendan de têr dike, ji rewşa parastvaniyê û ji nû ve avakirinan tên fahmkirin.

Ev rewş; zewacên di temenên biçûk de an jî ne bi daxwaza wê hatine kirin de, qelend, tore, rêbazên hevberdanê û weke cinayetên namûsê ku rewşên civakî yên di derbarê malbatê de nin û rewşa perwerdehiya jinê, derfetên xebatê, asta tevlêbûna jiyanê ya siyasî û civakî diyar dike piranî rewşa ekonomiyê ye.

Jin di bin desthilatdariya zayendî de, mixabin di bin kedxwariya serdestiya mêr de dimîne û li gel kapîtalîzma îroyîn de hê bêtir di nava kedxwariyê de difetise. Weke encam jî heger em li ser esasa hevkariya zayendî li vê meseleyê binerin em dikarin bibêjin ku jin di nava rolên “jina malê” û “dayik” de hatiye heciqandin.



# AZADBÛNA JINÊ REDKIRINA KAPÎTALÎZMÊ YE...

Kapîtalîzma ku êrişî hebûna mirovahiyê û hemû çanda jiyana wê dike, hemû qadên wê dike piyase, kedxwariya jinê ji tarîxa mirovahiyê û vir ve pergalên desthilatdariyê dewr girtiye, dagerandindiye ew derbasî rewşeke civakî kiriye.

Civakên zayendî afirandiye, hemû aygıtên devletê bo ji nû ve avakirina desthilatdariya mêrî bûna xwedî şêwe. Mêr; li malê reîs, li kar patron, di qada jiyanê de bêşert desthilatdar e.

Jin; di civaka kapîtalîst de li gel kedxwariya kedê di han katê li ser bedena xwe jî rastî kedxwariyê bûye û di bazara kapîtalîzma dirinde de bûye alaveke reklamê û cinsîtiyê.

**Heger ku rexneya kapîtalîzmê neyê kirin, têkiliya hilberîn û serfkariya kapîtalîst di ber çavan re neyê derbaskirin, weke jiyan burcewaziya çandî ya kapîtalîzmê ji jiyanan neyê derxistin dê behskirina têkoşîna jinê kêm bikeve.**

Ev kêmasiya mezin di têkoşîna jinan ya li hember serdestiya mêran de ji bilî hayjêçêbûna takekesî pê ve nabe tiştek. Di civaka kapîtalîst de halê xizanbûna jinê û di çerxa kapîtalîzmê de bêparbûna wê bivênevê ye.

Di vê rewşê de pêdiviyeke têkoşîneke antîkapîtalîst derdikeve holê. Jin; bi qutkirina girêdanên xwe yên sosyal û ekonomîk yên bi kapîtalîzmê re, li ser zemîna serfkirinê ya ji hilberîna kolektîf tê û di têkiliyên jiyanî yên kolektîf de divê xwe ji nû ve bi wate bike.

Bo têkoşîneke bi giştî divê kapîtalîzm ji kokê ve were redkirin

# AZADBÛNA JINÊ REDKIRINA DESTHILATDARIYÊ YE...

Sersebeba herî mezin ya di pergala serdestiya meran de dûçarmayîna çewsandinên cûda ya jinê hebûna destilatdariyê ye. Anarşîzm; tenê behsa serdestiya siyasî û ekonomîk na, beriya hemûyan, behsa daxwaza dawîlêanîna serdestiya mirovan ya li ser mirovan dike. Xwedîkarîn, li aliyê din jî bîatkirina xwedîkarîn, her du rewş jî encamên pêwendiyên hêzê nin.

Pîvana mutlaqbûyîna serdest, pîvana perestîşkirina hêzê ya serdest û ya di bin emrê wî de ye. Peywendiya hêzê ya ku serdest ferz dike ne yek alî ye, serdest bi xwe û bîatkirina kesê bi wî ve girêdayî tune be berdewamiya serdestiyê çênabe. Yê ku bîat dike dibe koleyê vê hêzê.

Serdest jî çi qas hêz di destê xwe de bigre ew qas tirsa windakirina wê hêzê tê de çêdibe û dibe koleyê hêza xwe. Di pergala serdest ya mêrê îroyîn de têkiliya jin û mêr heger di vê çarçoveyê de em binirxînin azadbûna jinê pêşiyê divê bi redkirina bîatkirina mêrê ku desthilatdar e ve dest pê bike.

**Bi vî şiklî azadbûna jinê bi redkirina desthilatdariyê û ji holêrakirina hemû şiklên çewsandinan yên ku serdest bikartînin pêkan e. Ji ber vê yekê dujminên mêr, dujminên dirûvên jinan bi wan dikevin lê belê bûnin mêr, bo bibin mêr diyardeya bivênevêya mecbûrmayîna serdestîbûnê ye.**

# JINÊN ANARŞÎST AZAD DIBIN...

'Di dîrokê de jinek di bin esaretê de heye. Li benda rizgarkirinêye, jina ku divê rizgar bibe. Rizgarîbûn jî; him bi şerê li hember dijberê cinsê xwe him jî bi têkoşîna avakirina dinyayek bi edalet û azad pêkan e. Rizgarbûn şoreş e. Şoreş jî ji bo jinê rizgarbûneke teqez e.'



Anarşîzm, vê ezbera dîrokî û mantiqa xetîn red dike. Jinên anarşîst; behsa jinên ku dê rizgarbûna wan bi hatina şoreşê pêk were nakin, behsa jinên ku dê xwe azad bike û şoreşa hundirîn ya ku ji roja îroyîn de ava kirine dikin.

Ev şoreşa hundirîn, şoreşa mirovên ku xeyalên xwe pêk anîne û qontrola jiyanên xwe ji îro de bidest xistine nin. Têkoşîna jinan bi tevayî be jî di heman katê de têkoşîneke şoreşê ye ku dê hemû mirovahiyê veguhezîne.

Avakirina civakek bêcinsîtî û bêserdest, bi rabûna kapîtalîzmê re avakirina cihaneke wekhev û bi edalet e. Ji ber vê hindê weke jinên anarşîst em rolên cinsîtiyê yên ku li me tên ferzkirin, ciyawaziya zayendiyê, fehmberiya serdestiya mêrî, mekanîzmayên desthilatdariyê û kapîtalîzma ku jiyana me ji me diziye red dikin.

**Bi pirrkirina qadên parvekirinên kolektîf em hevpariya dahûrandinên me yên civakî û ekonomîk ji îro de dikin. Em ji devletê û zemînên çareseriyê yê zagonên ku zimanê devletê nin hêvî nakin, em bi pevrebûneke kolektîf ya piştevanî û baweriyê ava dikin.**

Ji vî serî heta wî serê dinyê tê bihîstin; ji jinên bêxak yê Brezîlyayê, ji komûnên azad yê Zapatîstayan, ji bêîtaetên Kurdistanê, ji kesên komûna Parîsê yên ala wan reş, ji jinên wêrek yê Spanyayê qîrînên bilind dibin… Qîrîna jinên azad dibin… Qîrînên raperînê…

Guh bidin vê qîrînê…



# WEKE DIYARBÛNIYEKE DESTHILATI

# MÎLÎTARÎZM

*"Ez bawer dikim ku, giyanên dinyê yên evîndarî azadiyê, roja ku ji efendiyên xwe re bêjin ku 'Cinayetên xwe bi xwe bike! Me xwe û hezkiriyên xwe têra xwe feda kir bo şerên te! (…) Na, em êdî li ser navê te cinayetan nakin û bo xakên (welatên) ku te ji me diziye em şer nakin!' dê dawî li mîlîtarîzmê were."*
**Emma Goldman**

**Redkirina wijdanî ya ku weke li hember leşkeriya mecbûrî (ji ber sebebên olî, polîtîk, ehlakî û hwd.) tê bilêvkirin; li hember halanên şer yên zêde dibin, rêya herî kartêker ya rawestandina şer e. Li hember şer, li hember rijandina xwîna bira, li hember mirin û kuştinê hemû redkirên wijdanî li ser esasa parastina jiyanê birêxistin dibin.**

Redkirina wijdanî ya ku li Tirkiyeyê, di sala 1989an de, ji aliyê Tayfun Gönül ve bi aşkerakirina redkirina xwe ya wijdanî ketiye lîteratûra polîtik, ji xeynî redkirina leşkeriya mecbûrî, tegihîneke li hember mîlîtarîzma ku hemû jiyana me dagirker kiriye ava dike. Mîlîtarîzm weke peyv her çi qas koka wê ji peyva artêş û leşkeriyê were jî (Jêderka peyva mîlîtarîzmê bi Latînî militaris e ku wateya wê 'di derbarê leşker û şer de' ye) êdî ev têgeh di çarçoveyeke pirr fireh de tê ravekirin. Şideta ku niziliye hemû warên jiyanên me (çi veşartî, çi aşkere) bi afirandina tegihîneke mîlîter yekser takekes di bin tundiyê de dihêle.

Şideta desthilat ya ku li dibistanê, malbatê, kuçeyê û di gelek warên jiyana civakî de rewa bûye takekesan bi têgihîneke mîlîtarîst di bin tundiyê de dihêle. Ji ber statûyên civakî, girtina rolên civakî dike ku jiyan bibe mîlîter. Sermiyanê malê bav di têkiliyên malbatî de ji mîlîtarîzmê têr dibe, di jiyana civakî de mêr ji mîlîtarîzmê têr dibe, di hemû warên jiyana civakî de ji mîlîtarîzmê û ji lew re ji otorîteyê têr dibe.

Mîlîtarîzm şideta bi rêxistin e û şideta bi rêxistin derbasî hemû warên jiyanê bûye. Hemû diyardeyên mîlîtarîzmê, bi şikelî hiyerarşîk hatiye organîzekirin, di têkiliyên berdest û serdestan de ev yek aşkere tê xuyakirin. Di vê pêvajoya bivênevê de ya ku hatiye negengazkirin de takekes, nikare xwe ji wê bêhna sar ya mîlîtarîzme xelas bike.

Mîlîtarîzasyona ku bi jiyanê re dom dike, ji hatina mirov ya dinyê dest pê dike û heta dimre dewam dike. Her mirov her çi qas weke "pitikekî" were dinyê jî di hundirê têgihana xwe ya ku tê de hatiye dîlgirtin de mirov amadeyî leşkerbûnê dibe. Pêvajoya mîlîtarîzasyonê ya ku di malbatê de dest pê dike, di malbatê de bi avakirina têkiliyin serdestî û berdestiyê bi gewde dibe. Di malbateke bingehîn ya ku ji dê, bav û zarokan ve pêk tê li gor hîyerarşiyê pêşiyê bav tê, dû re dayik û herî dawiyê jî zarok tê. Ev merheleya ku hem bi rolên zayendiya civakî hem jî gihiştinên genotokrasiyê dest pê dike bi dest pê kirina dibistanê jî pêşketina xwe didomîne. Zarokên ku dest bi dibistanê dikin, piştî ku dikevin vê pêvajoya "perwerdehiyê" dikevin dezgeyên nîzamî, bi her sibeh bi şanaziya ku Tirk e sondxarinekê hêdî hêdî dibin leşker. "Perwerdehî" her ku pêş dikeve, bi dersên tarîxê, îdeolojî û tarîxa serdestên siyasal li wan tê ferzkirin; zarok bi dersa ewlekariya milî ji bo leşkergehan û ji bo "mirina bo welat" tên amadekirin.

Piştî van hemû merheleyan takekesê ku ava bûye êdî alaveke di xizmeta him bo îdeolojiya serdestî him jî bo hebûna desthilatdaran e.




Pêvajoya “afrandinê” ya ku bi salan e pêk hatiye ew qas bi ser ketiye ku êdî her kesî mirin ji xwe re kiriye nasname. Qîrinên şer yên gûr dibin, jidestçûyîn/şêlandinên jiyanan êdî nayên xuyakirin, bi şûn de jî tenê “takekesên ku vînên wan hatiye dizîn” yên ji afirandina mîlîtarîzmê mane dimînin.

Weke jinekê, mecbûriyeta ku divê rîayetî civakê bike him bi veşartî him jî bi aşkere rê li ber pêvajoyên mîlîtarîzmê vedike. Jina ku bi diyardeyên wekî serkan, bav û kalan, namûsî tê pêkutekirin û pirrî caran di vê pêvajoya ku jin tune tê hesibandin de îxtîmala ku azadiya xwe bi dest bixwe jî ji holê hatiye rakirin. Tekane nasnameya ku li jina bo welatê xwe kuran biwelidîne, bo çavên wê yî di hevser/evîndarê ku çûye bo welat canê xwe bide hatiye ferzkirin jî mirin e. Aîdiyeta civakeke bavkanî bûye mirina jinê. Mîlîtarîzm him di demên şer de him jî di demên aşitiyê de jiyana jinê rapeç dike. Jina ku di demê şer de kurên ji bo mirin û kuştinê amade xwedî dike, peyva “welat sax be” hînbûyî di demên aşitiyê de jî rastî şideta erkanî ya ku mîlîtarîzasyonê li ser wê ferz dike dibe. Jin şerên rasteqînî tune be jî, li gor rolên zayendî yên civakê şikl digre, ketiye halê pasîf yê kirdeyan yê ku parastin jê re divê û tune hatiye hesibandin.

Em mîlîtarîzma ku hebûna jinê, jiyana wê, nasnameya wê tune dihesibîne û vê yekê meşrû dike red dikin. Em li hember kişandina ber bi hundirê vî şerî, xwedîkirina ewladên ku mecbûrî xwînrijandina birayên xwe dibin, çavlirêtiya leşkeran, li ser navê namûsê tunehesibandinê, kuştinên li ser navê toreyê disekinin.

## Em red dikin!

Bela ku em anarşîst in em mîlîtarîzma ku vîna takekes tune dihesibîne, ew dixe binê pêkutiyan red dikin. Em dizanin ku mîlîtarîzm ew desthilatdariye ku bikaranîna takekes di pêvajoya diyarkirinê de weke alavekî bikartîne. Desthilatdarî bo berdewamiya xwe bînin, muxtacî kesên bênasname, bêvîn in û wezîfeya mîlîtarîzmê daîmîkirina hebûna desthilatdariyê ye.

**Em cîhaneke bêdesthilatdar, bêotorîte xeyal dikin û di pêvajoya ji nû ve avakirina cihaneke azad de em dizanin ku divê pêvajoya mîlîtarîzasyonê were tunekirin. Ji ber vê hindê em vê têgihîna tije şidet ya ku jiyanên me rapeç dikin bi hemû wijdanê xwe red dikin.**

# Di ŞER de Jin

**Şer, ji destpêka şaristaniyê û vir ve weke remza desthilatdariyê xwe îfade kiriye, jin jî weke dayik, hevser, zarok, dost û rêhevalekî bûne kirdeyeke şer him di asta yekemîn û him jî duyemîn de. Şer li aliyekî jinê di şert û mercên mîlîtarîst de bi pêkutiyeke ku hemû jiyanê dorpêç dike re rû bi rû dihêle, li aliyekî jî xwestiyê pê bide bawerkirin ku tiştên wê rûmet dane, kesên ji canê wê nin jiyana xwe ji dest bidin û vê yekê jî 'asayî' û 'bo welat' daye nîşandan.**

Jinên ku remza xakê û namûsa welat in, her tim weke êleke nin ku divê ji aliyê devletê ve werin parastin, li ser masayan di derbarê wan de afirandinên polîtîkayan dê bê kirin tê dîtin. Jini di warê civakî û siyasî de ne xwedî peyv in û biryarên devletê yên li ser masayan di derbarê wan de hatine dayîn li gor zagonên 'namûs' û 'rêzdariya' ku li wan hatiye fesilandin diyar dibe. Biryara qetla zarokên dayikan li ser navê parastina namûsê 'li ser maseyê' ji aliyê giregirên devletê ve tê stendin. Ev şer şerê kê ye, ev rêzdarî rêzdariya kê ye?

Îro qîrîna jiyanê ya dayikên li çar aliyê dinyê di her qirkirin, nijadkujî û şerî de bênavber olan dide. Weke ku li her derê dinyê li Tirkiyeya ku dergûşa şerên hertimî ya rojhilata navîn e, dayikên şemiyê yên êş û kesera zarokên xwe yên şoreşger yên di demên 12 Îlonê de hatine qetlkirin di dilên xwe de diparêzin û raperînên xwe li rûyê devletê dixin, bêyî ku bêzar û aciz bibin bo edaletê dengên xwe bilind kirin. Dayikên Aştiyê yên li Kurdistana ku şer ji ser kêm nabe bûnin parastgirên jiyanê,



hember êrîşên dijwar yên devleta faşîst û li hember li hember mirina ku weke cihokê xwîn dirijîne aştiyê diqîrin.

## Weke rêbazeke şer 'tecawuz':

Jinên ku yek bi yek bûnin kirdeya mîlîtarîzmê, zarokên xwe di şer de winda kirine, ji xeynî ku her roj ji aliyê desthilêt ve tê tecawuzkirin, bi rasteqînî ji di şer bi tecawuzê re rû bi rû dimîne. 'Tecawuza Etnîkî' ya ku fatoreya namûsê ye bo jînê, li Bosna-Hersekê di bin fermandariya Karadziç ve jinên ku di qetliyama Serebrenicayê hatine tecawuzkirin, yekîneyên 'demokrasiyê' yên Obama yên li Ebu Garipê bi dijwarî tecawuzî bi hezaran jinan kirine, li Filîstînê ji hêla leşkerên Îsraîlê, li Tirkiyeyê de di derdestkirinê de tecawiz û tacîz, li Kurdistanê ji hêla 300 leşkerî ve hatine tecawuzkirin û ji bilî vana bi sedan jinên Kurd yên ku bi tecawuzên etnîkî rastî hovîtiyan hatine, bi dehan mînakên bo namûsa destihaltdar hatine qurbankirin e... Kamile Öztürk, Ayşenur Şimşek, Cahide Karataş, Leman Çelikaslan, Sadet Akkaya, Menice Kırtay û bi sedan yên ku hê em nizanin…

**Jinên ku malzarokan wan tên daxkirin, yên serê pêsîrên wan tên jêkirin, yên li zeviyên xwînê bi qûndaxa sîlehan tên tecawuzkirin tenê zarokên xwe winda nakin. Weke remza xak û namûsê ji ber misyona xwe li gel ku zarokên xwe bo welat feda dikin, ji aliyê hêzên dijberî ve bo tunekirina zireta niştiman û tuximê dujminatiyê tên tecawuzkirin û dibin nûnerên eslî ya 'çanda fedaîtiya' mîlîtarîzmê.**

Şer û mîlîtarîzm ji ber xususiyeta xwe zayendî ye, weke jinên ku li hember qetlîamên ku tên kirin, dixwazin were kirin divê em dengê xwe bilind bikin, bi wijdanên xwe em dikin qîrîn: Em ê feda nekin, em ê nebin feda!

Êdî bes e!

